

**HEGER HÛN BIXWAZIN PIŞTGIRIYA VÊ
BANGEWAZIYÊ BIKIN JI VÊ E-MAILÊ RA
BINIVÎSIN: AKTIONANTIRA@POSTEO.DE**

WERIN DI VÊ XWEPÊŞANDAN DIJÎNIJADPERSTANE DE BEŞDARÎ BIKIN #UNTEILBAR-DEMO DEM: 4.9.2021 LI BERLINÊ

HAYDÊ, YALLAH, – JI BO PAYIZA GERM YA HEVGIRTINÊ

TÊKOŞINÊN LI DIJÎ NIJADPERESTIYÊ BIKIN YEK Û JI BO CIVAKEKE NEDABEŞBAR HEWL BIDIN

Payiza hevgirtina me berî şeş salan di “havîna 2015an, dema koçberiyê» de dest pê kir, dema ku dîwarê girtina penaberan a ewropî li ser sînorên derveyî Yekîtiya Ewropayê hat hilweşandin! Di 4.9.2021an de, em ê payîza hevgirtinê di xwepêşandana mezin a tifaqa #nedabeşbar (#unteilbar-Bündnisses) de bidomînin. Em xebatên xwe yên di warên dijî-nîjadperest, dekolonyal, queer-femînîst, dijî-faşîst, koçberî, kiriya malan, avûhewa û têkoşinên civakî bidomînin.

Di sala 2015an de, xwişk û birayên me sînorên navdewletî derbas kirin, çavdêriya mîlîtarîzekirî ya sînorî, Frontex’ derbas kirin û doza mafê xelkê, tevgera azad û penaberiyê kirin. Di vê navberê de,

piraniya civaka hevgirtî ji bo pêşwazî û xêrhatina her kesî amade bûn! Rêxistinên xweser ên koçberan, însiyatîvên penaberan, torên hevgirtinê, însiyatîv û kom hatin damezrandin heta ku bikarin piştevaniya penaberan û koçberan bikin, lewra ku ew baş werin û li Almanyayê bi rûmet bijîn û bixebitin.

Lê ji havîna 2015an ya dema koçberiyê û vir de gelek tişt qewimîn! Ji aliyekî ve, têkoşinên me yên dijî-nîjadperestî yên nedabeşbar, deng û jiyana me ya koçberî li Almanyayê hîn bihêztir kir û li aliyê din em jî rastî zext, zordarî û şideta siyasî hatin!

NIJADPERESTIYA BIPERGAJ, DIJ-SEMITİZM Û KUŞTINA TERORISMA RASTGIR

Piştî şewata kampa penaberan li Moria li Lesbosim, Septembara 2020î, Seehofer û Co bi awayekî tund hilgirtina penaberên ku di rewşek xeterenak de ne û bêmal bûne red kir û qebûl nekir ku kampên dijî-mirovî werin valakirin. Wan heta pejirandina penaberan li dewletên federal jî qedexe kir ku ew bi bernamêyên xwe yên dilxwaz nekarin pêşwaziya penaberan bikin. Vê siyaseta nijadperestane girseya ku di Deryaya Navîn de dimire hîn bêtir meşrû kir, di heman demê de li vî welatî perspektîfên mayînê kêr dibin û polîtîkayên dersînorkirinê tîne meşandin. Rizgarkerên deryayê tîne sûcdarkirin. Almaniya û hukûmeta Berlînê di wexta lokdownê de penaberan dersînor dikin û dişînin Afganistanê ku welatê herî xeternak li cîhanê ye.

Ev polîtîka li meclîsan û li kolanan wek avê ye ji bo aşê rastgiran! Herî xerab, kiryarên terorî yên tirsnaq, ên rastgir ên li Almanyayê, bêrawestan ji her kesî re diyar kir ku nijadperestî li hundir jî dîkuje. Siyasetmedarên AfD efsaneyên komploya nijadperestî û dijî-semîtik belav dikin û wekî milê meclîsê yê terorîsma rastgir tev digerin. Jiyana koçberan ne ewle ye ji ber ku dayreyên

dewletî ji rastgirên tundrew nehatin paqijkirin. Em 159 mexdûrên ku li Dessau, Kleve, Delmenhorst di binçavkirina polîsan de hatin kuştin bi bîr tînin. Heya roja îro, rayedarên siyaset û ewlehiyê bêçekirin û şerê torên rastgir ên di civakê de, di nava polîs, dadwerî û Bundeswehr de red dikin.

Em şîna xwişk û birayên xwe yên ku li Hanau, li Halle, li Kassel û li Munîhê ji hêla nîjadperestan ve hatin kuştin, digirin. Mexdûr nayên ji bîr kirin û di têkoşîna me de dijîn! Em ji bo dosyaya hevalên xwe yên li Hanau, bîranîn, edalet, zelalkirin û encamên giştî daxwaz dikin. Em dê rihet nebin, em dê netirsîn û em dê ji bo civata hevgirtî hewl û têkoşîna xwe bidomînin.

EM LI VIR IN Û EM DÊ LI VIR BIMÎNIN

Ji ber vê yekê ji bo me tiştê herî girîng ev e: Em ji bo her kesî jiyana xweş daxwaz dikin! Di dema pandemiya Corona de, me dît ku jiyana kê girîng e û ya kê ne girîng e. Siyasetmedaran bi domdarî tercîh kirine ku penaberan li kampên ne ewle, asê û karantîne bikin. Li şûna valakirin û peydakirina xaniyekî nenavendî ji penaberan û bêmalan re, derî li wan girtin!

Tevî ku hinan dikarî vegerin xaniyekî ewle, karkerên koçber neçar bûn ku ji bo meaşên birçîbûnê Spargel û fêkiyan berhev bikin an goşt li Tönnies li perçeyên piçûktir bikelînin. Ji bo pir kesan, koçber an ne, ev tê vê wateyê ku divê ew wekî paqijkerên kêr-mûçe û xebatkarên lînêrîne yên li nexweşxaneyan heya mirinê bixebitin. Ew neçar bûn ku li ser kaseyan bisekinin, xwarinê bişînin ber deriyê xaniyên xwe, û pîrî caran mirovên di nav malan de wekî koçberên neqanûnî paqij bikin û lê binihêrin.

Tevî ku niha ev nîfşê 3an e ku ew li Almaniya dijîn, dixebitin û bacê didin jî, heger ne hemwelatiya Almanyayê bin, mafê wan ê hevserokatîyê yê

demokratîk tune. Dema ku hema hema 10 mîlyon mirov ji hilbijartin û referandûmê dûr bimînin, ev nijadperestiya ne demokratîk û bipergal e.

Jîngehkuji ji mêj ve ji bo mirovên li Başûrê gerdûnê rastiyeke e û yek ji wan sedemên herî cidî yê revînê ye, ji ber vê yekê ye ku têkoşîna dadmendiya avûhewayê bi têkoşînen dijî-kolonyalîst ve bi regekek necudabar ve girêdayî ye. Talankirina paş-kolonyal a çavkaniyên fosîl ên li Başûrê gerdûnê, jiyana û jîngehên xwezayî yê mirovan ji berî pandemiyê heye. Pandemiyê ev zincîra newekheviya cihanî pir zêde kiriye. Belavkirina nehevseng a kelûpelên bijîjkî û qanûnek patentê ya bi tenê ji bo berjewendiyê, ne ji bo tenduristiyê di vê berdehamiyê de ye. Ne hilweşîna avûhewayê û ne jî pandemî li ser sînoren neteweyî radiwestin! Pêdiviya me ya lezgîn ji bo her kesî bi çareseriyên cihanî heye!

LÎSTIK BIDAWÎ BÛ! EM NAXWAZIN CAREKÎ DIN LI NIJADPERESTIYA KAPÎTALSTÎ Û NORMAL VEGERIN!

Têgihîştina me ev e: em di serdemeke pir guherbar de dijîn, her tişt vekirî ye, û bi ku ve diçe; bi têkoşîn, dîtin û tifaqên me ve girêdayî ye! Pêdiviya me ya lezgîn ji bo her kesî derketina nav civakeke hevgirtî ye! Di 4/9/2021 de em dê li Berlînê bin da ku bi zelalî bibêjin; rojbiroj me bi têkoşîn û hevgirtina xwe ya destanî ronahî xiste nav tariya qirêj û em dê vê bi her awayî bidomînin!

**چلو چلو, VAMOS, ALLEZ,
DI 4/9 DE EM LI DIJÎ
NIJADPERESTIYÊ RABIN
#UNTEILBAR-DEMO!**

EM DAXWAZ DIKIN:

***Niha were legalîzekirin!
Ji bo mafê rûniştinê ji bo her kesî!***

***Derxistina demildest!
Ji bo mafê xanî ji bo her kesî!***

***Li dijî hiştin ku li Deryaya Navîn bimirin!
Ji bo mafê rizgarkirina di tengasiyê de li deryayê!***

***Bêyî dengên me demokrasî çênabe!
bo mafê dengdanê ji bo her kesî!***

***Dersînornekirin!
Ji bo mafê azadiya tevgerê ji bo her kesî!***

***Parastina qanûna bingehîn were betalkirin!
Ji bo paqijkirina rayedarên nijadperest!***

***bêçekkirina Nazis!
Ji bo jiyaneke ewle ji bo her kesî!***

***Li dijî şert û mercên xebitandinê! Hatina bingehîn a
bê şert û merc ji bo her kesî!***

***Bi tenduristiyê re berjewendî tune!
Ji bo mafê karûbarên berjewendîya gelemperî
ji bo her kesî!***

***Li dijî bikaranîna ekosîstem û mirovan li başûrê cihanî!
Dadmendiya avûhewayê ji bo her kesî!***

PIŞTGIR:

ABA - Aktionsbündnis Antirassismus, ABA - TK (Türkiye-Kürdistanli Göçmenler Platformu), Afghanischen Aufschrei Düsseldorf, Afrique-Europe-Interact, AG Asylsuchende SOE e.V., AG Right to the City for All der Kampagne Deutsche Wohnen und Co. Enteignen, Alarm Phone Berlin, Amaro Foro, Asmara's World e.V., Balkanbrücke, Bundesweites Aktionsbündnis ‚NSU-Komplex auflösen‘, Community for all, Ende Gelände, FLINTA* Netzwerk, Flüchtlingsrat Hamburg, Flüchtlingsrat Thüringen e.V., Flüchtlingsrat Wiesbaden, Gemeinsam gegen die Tierindustrie, Ihr seid keine Sicherheit!, Initiative Amed Ahmad, Initiative Duisburg 1984, Initiative für die Aufklärung des Mordes an Burak Bektaş, Initiative gegen das EU-Grenzregime in Afrika, Initiative Postmigrantisches Radio, International Women Space, Interventionistische Linke Berlin, ISD-Initiative Schwarze Menschen in Deutschland Bund e.V., Jüdische Stimme, Jugendliche ohne Grenzen, Kampagne „EntnazifizierungJETZT“, kein mensch ist illegal – Hanau, kein mensch ist illegal - Kassel, KOP-Kampagne für Opfer rassistischer Polizeigewalt Berlin, Kotti & Co, Lager-Watch Thüringen, Medibüro Berlin, Mediterranea Berlin, Migranos Movement, Nicht ohne Uns 14 Prozent, OMAs gegen Rechts. Berlin, Right to the City AG bei Deutsche Wohnen Enteignen, RomTrial, Seebrücke, Seebrücke München, Solidarity City Berlin, Theater X, unofficial.pictures, Leipzig/Suhl, Verein für die solidarische Gesellschaft der Vielen e.V., We'll Come United, Wohnungslosenparlament in Gründung, Zusammenleben Willkommen



[WWW.FACEBOOK.COM/EVENTS/1671983332998772](https://www.facebook.com/events/1671983332998772)